

Jenosîda domdar û rojhelata nêzik

Jenosîd, ji nuh ve li Tirkîyeyê aktuel bû, dewleta Frenseyê xwest ku qanûneke nuh derxe, di vê qanûnê de înkarkirina jenosîdê wek sûc tê pejirandin û li Frenseyê yekî ku vê jenosîdê înkâr bike, wê wek yekî sûcdar bê pejirandin.

Li temama dinyayê gelek dewlet bi sûcê jenosîdê tînan tawanbarkirin. Dewletên Yekgirtî yê Emerîka (DYE), di meseleya Çermoran de, ji bo zulma li ser Reşikan tînan tawanbarkirin. Di Herba Duyem ya Cîhanê de, piştî ku artêşa Almanan tînan diçe, Alman li bajarê Dresdenê kom dibin, hêzên Brîtanî û Emerîkî sê rojan vî bajarî bi şev û roj bombebaran dikin, tînan gotin ku li wir dused hezar însan hatine kuştin. Karê Emerîka yê ku li Japonyayê kiriye, bombeya atomî avêtiye du bajaran (Nagazakî û Hîroşîma). Hin nivîskar ji bo Sowyetê, di bîst salên ewil de qala çar heb jenosîdan dikin; ya yekem ya gundîyên dewlemend (Kûlak), ya duyem jenosîda li Ûkranyayê, ya sêyem jenosîda ku di hundirê partîyê de pêk hatiye, ya çarem jî jenosîda ku Sowyetê di Herba Duyem de pêk aniye ku gelek etnîsîte ji cîyên wan dûr xistiye. Ji bo Frense û Awûstûralyayê jî hin tişt tînan gotin.

Ev hemû dewlet bi jenosîdê tînan tawanbarkirin. Ji van hemû dewletan tu reaksiyoneke mezin derneket. Di qanûna ku li Frenseyê wê derkeve, ne Ermen ne jî Tirkîye tînan binavkirin. Lê Tirkîyeyê înfialeke mezin dîyar kir, yekîtiyeke mîlî ji nuh ve ava kir. Li hember vê qanûna ku wê li Frenseyê derkeve AKP, MHP, CHP temama partîyên wan, heta temama rewşenbîrên wan, ev helwesta Frenseyê li dij azadîya ramanî qebûl kirin.

Ev ne tişteki xwezayî ye, ewqas dewlet tînan tawanbarkirin, reaksiyoneke mezin dernakeve holê, ji bo çî Tirkîye reaksiyoneke ewqas mezin û tînd dîyar dike? Ji Serokwezîrê wan heta Serokê Komara wan, ji sazîyên wan yê sîwîl heta grûbên parlamena wan reaksiyonên tînd dîyar kirin.

Jenosîda Sîstema Serwerîya Tirkan berdewam, berfireh, dûr û kûr e

Li vir ez ê îdia bikim ku, ji bo van dewletên din karê jenosîdê neheqîyên dîrokî ne, di dîrokê de mane. Ji bo Tirkan û Dewleta Tirkan karê jenosîdê ne karekî dîrokî ye, mijareke berdewam e. Ev dewlet, hîn jî vî karî didomîne. Ji ber vê yekê, gava ku li devereke dinyayê li hember jenosîdê gawek bê avêtin, ev dewlet wê gawê li hember xwe dipejirîne. Û bi ya min, di vî warî de jî ne neheq e. Yekî ku hîn jî karê jenosîdê bidomîne, wê pirtir xof bigire, bitirse ku hek ev çalakî bi ser keve ew ê xisarê jê bibîne.

Di dîroka her miletî de û heta di ya her dewletî de, gelek qetlîam, zor û zordestî hene. Di dîroka gelek dewletan de jenosîd jî heye. Lê ev karê qirêj ku di dîrokê de hatiye kirin, li dinyayê êdî di dîrokê de maye û bûye neheqîyeke dîrokî. Tirkîye, di vê meseleyê de, ji hemû dewletên dinyayê yê din cudatir disekine. Ji ber ku ew hîn jî vî karî didomîne, ji bo Sîstema Serwerîya Tirkan jenosîdkarî, terza hebûna vê sîstemê ye. Ev sîstem bêyî jenosîdkarî, nikare xwe nuh bike. Cudatîya di nav Dewleta Tirkîye û dewletên din de ev e. Bi ya min ji bo niqaşa jenosîda li Kurdîstanê, xala herî girîng ev e.

Di vê niqaşê de, Tayîb Erdoxan helwesteke tînd girt, destnîşan kir ku tu dîroknas, tu sîyasetmedar nikarin di dîroka wan de jenosîdê bibînin, yê ku li jenosîdê digerin divê li dîroka xwe binêrin. Ev meydanxwendineke mezin e, divê em ji rêvebirên dewleta Tirkan bibirsîn, sedema vî culhetî çî ye? Dewleteke ku li ser jenosîdê ava bûye, çawa dikare li hember dinyayê meydan bixwîne û bibêje ku di dîroka me de karekî wenî tune?

Gelek sedemên vê hene, lê ez dixwazim li ser du sedeman bisekinim. Yek jê ew e ku, muxatabên wê jî, di vî warî de ne destpaqij in. Temama dewletên kolonyalîst, di mijara qetlîamên girseyî de û di mijara jenosîdê de ne destpaqij in. Frense, di jenosîda Ermenan de jî xwedî mesûlîyet e. Vahakn N. Dadrian, ji bo helwesta dewletên Rojavayî ya di jenosîda Ermenan de wisa dibêje; "aktorên sîyaseta navdewletî, hek bi yekîti û biryardayî mudaxeleiyê zulma ku di hundirê dewletekê de nekin, dikare ji fêdeyê pirtir xisarê bide." Li vir ew îşaretî sîyaseta dewletên Rojavayî, bi taybet jî ya Frense, Brîtanya û Rûsya dike ku, di serdema dewleta Osmanî ya dawîn de, him mudaxele kirin, ji Ermenan re şerdên jîyaneke azad xwestin, vê yekê jî tesîr li Ermenan kir, wek qawet ji xwe re pejirandin. Dadrian, bi vê sedemê, ji ber ku li vê helwesta xwe ya piştgiriyê xwedî derneketine, dawîya wê neanîne, helwesta dewletên Rojavayî ya di jenosîda Ermenan de tawanbar dike û wan jî di vî karî de mesûl dibîne. Yek jê ku ya Tayîb Erdoxan jê culhet distîne ev e.

Di sîyaseta Kurdan de tunebûna fahm û helwesteke zelal û hevpar

Ya din ku ez ê îro pirtir li ser wê niqaş bikim jî ev e: Di hundir tevgera sîyaseta Kurdîstanê de, di derheq mijara jenosîdê de, fahmekî zelal û muşterek tune. Tesbîtkirna sîyaseta jenosîda li Kurdîstanê, ne tenê tesbîteke dîrokî ye. Hek tu tesbît bikî ku jenosîd li qewmê te dibe, divê tu li hember vê jenosîdê planekê, nexşerêyekê û çalakîyan pêk bînî. Tenê gotina jenosîdê, ne karekî sîyasî ye. Yekî dîroknas an zanyar dikare tiştêkî wisa bibêje, lê hek tu tevgerê sîyasî ya azadîya mîlî be, divê li hember vê jenosîdê tu xwedî nexşerê be, planek te hebe û li ser van tu xebata sîyasî bidomîne. Bawerîya min ew e ku, hek li hember jenosîda li Kurdîstanê nexşerê û planek li ber Kurdan hebûya û li gor wê tevbigeriya, Tayîb Erdoxan bi rehetî nikaribû culhet bikira ku vê peyvê bibêje.

Li vir pirseke din jî heye, gelek rewşenbîr û sîyasatmedar bi awayekî optîmîstî him li AKP û him jî li dinyayê dinêrin. Dibêjin ku, "ji bo çi ev dewlet qebûl nake ku jenosîd li Ermenan kiriye? Bila nebêje me jenosîd kiriye, bila bibêje ku me qetlîamek kiriye û em uzrê xwe ji Ermenan dixwazin". Bi salan e ev kadroyên optîmîst, vê tesbîtê dikin û bangî rêvebirên dewletê dikin ku werin vê helwesta xwe biguherînin. Lê tu guherandin di helwesta dewleta Tirkan de çênabe. Li vir lazim e em vê jî bipirsîn, ji bo çi? Li gor min, sedema ku dewleta Tirkan nikare jenosîda Ermenan qebûl bike, karê dewletê yê li Kurdîstanê ye. Hek dewleta Tirkan li Kurdîstanê jenosîd nedomandiba, jenosîda Ermenan ji bo vê dewletê wê bibûya neheqîyeke dîrokî, wê hîn bi rehetî ev jenosîd bipejiranda, uzrê xwe bixwesta. Sedema ku dewleta Tirkan di qetlîamên Ermenan de, di jenosîda Ermenan de helwesteke ewqas tûnd distîne, hebûna vê dewletê ya li Kurdîstanê ye. Bi sedem ku karekî jenosîdî didomîne, nikare karê jenosîdê tenha di meseleya Ermenan de bihêle. Têdigihê û fahm dike ku bêyî çareserîya Kurdîstanê nikare neheqîya ku li Ermenan bûye, qebûl bike.

Ji bo dewleta Tirkan tê gotin ku sîyaseta red, înkâr û qasî ku pêk tê îmhakirinê pêk tîne. Ev tesbîd rast e, feqet ev ne sîyaseteke arizî ye, ne sîyaseteke ku dikare bike jî neke jî, îdia min ev e ku ev terza hebûna vê sîstemê ye. Ev sîstem tenha dikare bi jenosîdê xwe nuh bike, tenha bi jenosîdê dikare hebûna xwe bidomîne. Cîyê ku aniha jî lê jenosîdê bi kar tîne jî Kurdîstan e. Heta ku pirsgerêka Kurdîstanê çareser nebe, ne pêkan e ku dewleta Tirkan bikaribe rûqalî rabirdûya xwe bibe. Ev jî têtîneke nuh ya van demên dawîn e, pir zêde tê bikaranîn. Hêvîdar im ku wê dem bimîne ku em li ser vê têtîne cardin bisekinin, bi Tirkî jê re dibêjin "yüzleşme". Her kes ji hêla xwe ve bang li hukûmeta Tirkan dikin ku, "were em rûqalî rabirdûya xwe bibin". Hek dem bimîne em ê di dawîyê de li ser meseleya "yüzleşmek" (rûqalbûn-rarûbûn) jî bisekinin.

Têgîna jenosîdê

Hevalên hêja, li vir peyva têtîna, bi wateya mefhûm, qawram ez bi kar tînim. Di vir de jî hin niqaş hene; têtîna, têtîna û hwd. Fikrên nuh tenha bi têtîna nuh pêkan in, ji bo ramanên nuh pêwîstî bi têtîna nuh heye. Esasen peyva jenosîdê jî, ji hewcedarîyeke wenî derketiye holê. Her têtîna di hundirê paradîgmayeke fikrî de bi wate ne, bi ya min têtîna bi serê xwe bêyî paradîgma bê wate ne û di paradîgmayên fikrî yê ji hev cuda de wateya têtîna jî cuda ye.

Di tevgera sîyaseta Kurdîstanê de, gava em li lîteratura xwe dinêrin; têtîna jenosîdê gelek car hatiye bikaranîn. Aniha em li lîteratura kîjan grûbê binêrin, em ê bibînin ku grûbên sîyasî yê Kurdîstanê, belkî bi dehan jenosîd li Kurdîstanê tarîf dikin; jenosîda Qoçgirî, Zîlan, Dêrsim, Mahabad, Helepçe, Enfal, Sînemaya Amûdê û hwd. Lê tu kes hewl nade ku, van bûyeran bi hev girêde û wek pêvajoyeke jenosîdê tarîf bike. Ji ber tunebûna vî fahmê zelal û muşterek, Ahmed Turk ê ku serokê Kongreya Civaka Demokratîk e, ji bo kuştina 35 kesên ji Roboskîyê têtîna jenosîdê bi kar anî, got ku ev jenosîd e. Bayram Bozylê ê ku serokê HAK-PARê ye, di bernameyê telewîzyonê de got ku, kar û barên ku li hefsa Diyarbekirê pêk hatin jenosîd e. Hevalên BDP-PKK-KCKyî dibêjin ku jenosîda sîyasî heye, jenosîda çandî heye, jenosîda ekolojîk heye. Di mijara jenosîdê de, bêserûberîyek di nav tevgera sîyasî ya Kurdîstanê de heye. Têtîna, ji bo fahmkirina bûyer û pêvajoyan pêwîst in, hek di têtîna sîyasî û civakî de, em ne bi hesasiyet bin, em rê li pêşîya fahmkirinê digirin. Hek têtîna di cî de neyên bikaranîn, rêya fahmkirinê jî li ber me digirin. Ji ber vê yekê, fikirandinên nuh bi têtîna nuh pêkan in û ev têtîna nuh jî divê cewaz bide ku em rasteqîniya li derveyê xwe çêtir û baştir fahm bikin, ne ku pêşî li me bigirin ku em rasteqîniya objektîf fahm bikin.

Wê bê bîra hevalên ku di temenê min de ne, di salên 1974-78an de, me bi du têtînan sîyasî dikir; yek jê ev bû ku Kurdîstan kolonî ye, ya duyem jî ev bû; mafê çepgirên Kurdan heye ku rêxistinên xwe yê cuda saz bikin. Ev netîca fahmekî bû, netîca fikirandinê nuh bû di tevgera Kurdîstanê de. Wateya vî fahmê nuh ev bû; em miletek in, welatekî me heye, çareserîya vê pirsgerêkê serxwebûn û yekîtiya Kurdîstanê ye. Ji vê fikirandinê derdiket ku, em bibêjin Kurdîstan kolonî ye û mafê me heye ku em rêxistinên xwe yê cuda ava bikin. Ev têtîna di van salên dawîn de, hinekî ji rojeva me derketin. Mesela, serxwebûna Kurdîstanê, yekîtiya Kurdîstanê, kolonîbûna Kurdîstanê ji rojeva me derketin.

Di mijara jenosîdê de û di hemû mijarên din de, berê peyv tunebû, pirtûka pîroz bi wê dest pê dike, dibêje ku berê peyv hebû, lê têtîna jenosîdê, peyva jenosîdê piştî bi sedan sal ketiye rojeva mirovatîyê. Ji ber vê divê em peyva jenosîdê û bûyerên jenosîdê yê di nav dîrokê de ji hev cuda bibînin û paşê wan li hev ragirin.

Jenosîd karekî modern û sîyasî ye, mutahîdê jenosîdê kolonyalîzm e

Bi ya min jenosîd karekî sîyasî ye, dema peyva jenosîdê tê bikaranîn tiştên ku tên bîra min ev in; qetlîamên mezin, xwînrijîyên gelek dijwar, zulm û zotdestîyên mezin. Lê ev cure bûyer, di kûrahîya dîrokê de her tim hebûne, di her du herbên cîhanê de bi dehan milyon însan hatine kuştin, di seferên Moxolan de, di yê Îskenderê Mezin de bi milyonan însan hatine kuştin. Dîrok bi xwe bi qetlîam û xwînrijîyên mezin ve tije ye. Ji bo çî ji bo van bûyeran peyva jenosîdê nehatiye bikaranîn? Temenê têtîna jenosîdê 64 sal e, lê ev bûyerên ku em qala wan dikin pêncsed sal berê ne.

Di qeneta min de, jenosîd karekî modern e, karekî sîyasî ye, ne karekî bêaqilane ye, ne karekî hin însanên teyş û dîn û beredayî ye. Berevajîya vê, karekî modern e, kar û barên jenosîdê bi modernîteyê ve girêdayî ye û dikarim bibêjim ku mutahîdên jenosîdê kolonyalîzm e, ew jî bi modernîte û modernîzmê ve girêdayî ye. Netewdewlet û avakirina netewdewletan berdeyamîya kolonyalîzmê ye, netewdewletan ev îhale ji kolonyalîzmê

dewr girtine û bi awayên xwe domandine. Di dîrokê de ji ber ku pêwîstî pê hebûye jenosîd hatiye bikaranîn, ne ji bo xerabî û nebaşîya hin mirovên xwînswar ev kar derketiye holê. Di pêvajoya modernîteyê de ev kar pêwîst bûye, ev kar jî bi vî awayî ketiye rojeva mirovahîyê. Jenosîd karekî navdewlet e, karekî dewletan e. Tu grûb, tu eşîr, tu beşên civakî bi serê xwe nikarin karê jenosîdê bikin. Ji bo ku ev kar bibe aktorek lazim e, ev aktor jî dewlet e, aktorên jenosîdê dewlet in.

Binavkirin û cezakirina jenosîdê, karekî navdewletî ye. Ketina wê ya rojevê jî, bi globalîzasyonê ve girêdayîye. Lihemberderketin jî ne karê dewletekê ye, karekî navdewletî ye, jixwe gava em li pêvajoya globalîzmê binêrin, em ê bibînin ku sazî û dezgehên navdewletî, di serdema globalîzasyonê de derketine holê, zêde bûne, xurt bûne û bûne desthilatdar. Ji Cemîyetî Akwam bigirin û heta Dadgeha Cezayê ya Romayê, ev hemû dezgehên navnetewî yên globalîzasyonê û desthilatdarîyê ne.

Civakên ku tiştê in dibin hedefa jenosîdê

Di hedefa jenosîdê de kesayetî tune, jenosîd kolektîfan ji xwe re dike hedef û yên ku dibin hedefa jenosîdê, ne ku ji ber ku tiştê kirine dibin hedefa jenosîdê, ji bo ku tiştê in dibin hedefa jenosîdê. Ew dewleta ku dixwaze jenosîdê li ser civakekê pêk bîne, di hundirê wê civakê de lênagere ku kîjan baş e an nebaş e, kîjan sîyasetê dike an nake, kîjan oldar e kîjan ne oldar e, kîjan dewlemend e kîjan hejar e, li van taybetîyan qet nanêre. Dibêje ku tu ji vê civakê ye an ne ji vê civakê ye? Hek ji wê civakê be, ew di ber hedefa jenosîdê de ye. Tu taybetmendiyên şexsî nabe sedem ku tu bibe hedefa jenosîdê. Taybetmendiyên te yên wê civakê, dibe sedem û têrê dike ku tu bibî hedefa wê jenosîdê.

Di karê jenosîdê de xaleke girîng ya din jî heye; jenosîd bi qestî mahsûsa tê kirin, nêtkirin di karê jenosîdê de xala esasî ye. Li dinyayê tu jenosîd bi awayekî bêhemdî çênabe, artêşek jixweber an bi serê xwe jenosîdê çênake. Li paş jenosîdê qesteke taybet heye ku civakekê ji holê rake, ji bo jîholêrakirinê planeke taybet heye, ji bo pêkanîna vê planê jî dewlet û hemû sazî û dezgehên dewletê pêwîst in.

Heta ku hatiye gîhaştiye qonaxa jenosîdê, gelek têgînên din hatine niqaşkirin. Di serî de lazim e ez bibêjim ku, ji bo têgîna jenosîdê em deyhndarê Raphael Lemkin in ku ew yekî esilcihûdê Polonî ye. Lemkin wek teknîkên jenosîdê di heyşt xalan de dîyar dike, ev heyşt xal di nav lîteratûta me de jî cî bi cî tînen bikaranîn, lê her yek bi serê xwe tê bikaranîn, lewra ez dixwazim qala van xalan bikim:

- 1- Qirikirina sîyasî.
- 2- Qirikirîna her tiştên zindî.
- 3- Qirikirîna hawirdor.
- 4- Qirikirîna însanan.
- 5- Qirikirîna çandî.
- 6- Qirikirîna etnîkî.
- 7- Qirikirîna aborî.
- 8- Qirikirîna civakî.

Lemkîn, van xalan wek teknîkên jenosîdê pêşniyar dike. Karê jenosîdê karekî gelepmerî ye, karekî total e, karekî global e. Ev kar bi van teknîkan pêk tê. Di lîteratura me de, di van salên dawîn de jenosîda sîyasî jî pir zêde bûye, qirikirina sîyasî dibe, lê jenosîda sîyasî nabe. Qirikirina sîyasî teknîkeke jenosîdê ye, gava em bibêjin jenosîda sîyasî em gelemperîya jenosîdê paşguh dikin û teknîkeke jenosîdê dixin dewsa jenosîda ku bi gelek teknîkan pêk tê. Jenosîda çandî di lîteratura me de pirtir cî digire, qirikirina çandî jî di nav karên jenosîdê de teknîkek e.

Jenosîd û hin têtînen din; qetîlam, kokbirî, asîmîlasyon, denasyonalîzasyon, barbarî, wandalîzm, sûcên li dij mirovahiyê

Jenosîd, bi hin têtînen din jî re têtîldar e û gelek çaran jî di şûna hev de tên bikaranîn. Ji bo fahmekî jenosîdê yê zelal û hevpar divê em qala wan jî bikin. Yek jê qetlîam e ku em jê re dibêjin qetîlam, di Kurmancîya nuh de jê re komkujî an komelkujî jî tê gotin. Qetîlam ew e ku bi hejmareke zêde însan tên kuştin. Qetîlamên mezin hene, yên biçûk hene, her qetîlam ne jenosîd e, ji bo jenosîd pêk bê qetîlam ne ferz e. Ji bo rasteqîniya miletekî ji holê rabe, ji bo ku civakek bê qirkirin qetîlam ne pêwîst e. Di temama kar û barên jenosîdê de qetîlam xwiya dike, lê ne ku hek qetîlam tunebe ew kar û bar nabe jenosîd. Her qetîlam ne jenosîd e û ji bo em ji kar û barekî re bibêjin jenosîd, qetîlam ne ferz e. Qetîlama li Dresdenê ya ku Brîtanya û Frense dused hezar însan kuştin, qetiameke pir mezin e. Kuştina sî û pênc gundîyên me yên li ser sînor jî qetîlam e, lê ne rast e ku em ji her qetlîamê re bibêjin ev jenosîd e.

Wê rojê mamoste Şemsedîn qala peyva "kokbir"ê kir, bi ya min em dikarin vê peyvê di şûna "etnik temizlik" a Tirkî de bi kar bînin. Vê yekê jî bi tena serê xwe em nikarin wek jenosîdê bi nav bikin. Kokbirîya etnikî bi qetîlam jî dibe û bê qetîlam jî dibe. Li ser qirkirina Pontûsan ev niqaş heye, li wir kokbirîyeke etnikî pêk hatiye, ev jenosîd e an ne jenosîd e, cîyê niqaşê ye.

Asîmîlasyon heye, hek dem bimîne ez dixwazim em li ser vê jî niqaş bikin. Di lîteratura kevn de, asîmîlasyon wek denasyonalîzasyon tê bikaranîn. Cara yekem ez di pirtûka Zîya Gokalp de li vê peyvê rast hatim, di wê pirtûkê de asîmîlasyon jî denasyonalîzasyon jî tê bikaranîn. Hek civakek ji hemû taybetmendîyên xwe yên netewî bêpar bê hiştin û cudatîyên wan yên ji civakên din ji holê bê rakirin ev denasyonalîzasyon e û bi ya min ji asîmîlasyonê baştir watedar e. Lemkin li ser vê jî sekiniye, ango heta ku gîhaştîye têtîna jenosîdê, fikiriye ku têtînen wek asîmîlasyon û denasyonalîzasyonê hene, gelo pêwîstî bi têtîneke nuh ango jenosîdê heye an na? Lemkin, dibêje ku ev denasyonalîzasyon an jî asîmîlasyon tenê rûdaneke jenosîdê tarîf dike, ev têtîn jî tenê bêparhiştina nirxên mîlî îzah dikin.

Têtînen din jî hene, wek mînak; Almanîzekirin, li vir em dibêjin Tirkîfîzekirin (Türkleştirme). Ev jî civakekê ji xwe re dike hedef ku nirxên xwe yên mîlî empozeyî wê civakê dike.

Di nivîsên Lemkin yên ewil de, ev her du rûdan bi hev re wek jenosîdê tên tarîfkirin. Him tu yê civakekê ji nirxên wê yên mîlî bêpar bihêle û him jî tu yê nirxên xwe li ser wê ferz bike û empozeyî wê bike.

Têtîna barbarî heye, Lemkin di 1933yan de di konferanseke huqûqî de vê têtîne pêşniyar dike, ji bo qirkirina Suryanan ya 1933yan. Cîyê Suryanan di gelek cî de wek Simile (Sêmêlê) derbas dibe, ev der nêzîkî sînorê Sûrî ye û aniha di bin serwerîya Başûrê Kurdîstanê de ye. Di sala 1933yan de Suryanên wê deverê doza mafên xwe yên mîlî dikin, dewleta Iraqê bi awayekî hovane êrîşî ser wan dike û tê gotin ku li wir bi qasî 3-5 hezar Suryan tên kuştin. Suryan aniha jî wê rojê wek roja bîranîna şehîdên xwe bi bîr tînin. Lemkin, di vê civînê de ji bo vê bûyerê têtîna barbarî pêşniyar dike, lê nayê pejirandin. Lemkin, li gel barbarîyê têtîna wandalîzmê pêşniyar dike. Wandalîzm, nêzîkî têtîna qirkirina çandî ye ku çî nirx hebe, dide ber xwe û ji holê radike.

Ev hemû ji bo çî girîng in? Tenê bi perspektifeke dîrokî em dikarin bûyer û pêvajoyan serast bi nav bikin. Jenosîd jî di van merhaleyên re derbas dibe û tê dibe têtîn.

Têtîna jenosîdê bi sûcên li dij mirovahiyê re jî têtîldar e. Di neteweyên Yekbûyî de ev niqaş jî tê kirin. Dibêjin ku jixwe sûcekî li dij mirovahiyê heye, çima em ê bi navê jenosîdê vî sûcî tarîf bikin? Têtîna sûcên li dij mirovahiyê, cara yekem di sala 1863yan de ji teref Lincolnê serokdewletê Emerîkayê tê bikaranîn. Paşê di sala 1907an di Konwansiyona Laheyê de derbas dibe. Ji bo niqaşa me ya herî muhîm ev e: Di sala

1915an de Frense, Brîtanya û Rûsya bi hev re deklarasyonê diweşînin û di vê deklarasyonê de wisa dibêjin: Ev helwesta Osmanîyan ya li hember Ermenan, sûcê li dij mirovahîyê ye, divê em vî sûcê ji sûcê herbê cuda binirxînin. Ev her sê dewlet, li paş vê deklarasyona xwe jî disekinin, dewleta Osmanî mecbûr dikin ku ji bo qirkirina Ermenan dadgehan saz bike, sûcdarên vê bûyerê bîn dadkirin. Di van dadgehan de gelek failên vê bûyerê tên girtin, cezakirin, surgûnkirin, heta hin ji wan tên darvekirin jî. Ev têgîn di sala 1915an de ji hêla van her sê dewletan ve tê pêşkêşkirin.

Konwansiyona 1948an

Em werin ser konwansiyona ku di sala 1948an de, di civîna Neteweyên Yekbûyî de hatiye pejirandin. Di sala 1951ê de ev konwansiyon êdî hatiye bikaranîn. Ji bo vê konwansiyonê Samantha Power, di pirtûka xwe de dinivîsîne ku, konwansiyona jenosîdê xebata mirovekî ye, ev mirov jî Lemkin e. Di wê çaxê de hemwelatîyê Emerîkayê ye, di hemû civînên navdewletî yên huqûqî de cî digire. Ji 1946an heta 1948an, Lemkin ji bo pejirandina vê konwansiyonê, bi tena serê xwe ji temama dewletan pirtir çalak e. Yên ku di serî de, di civîna Neteweyên Yekbûyî de, di sala 1946an de, ev konwansiyon pêşniyar kirine Kuba, Panama û Hindîstan in. Piştî niqaşên du salan ev hatiye pejirandin. Di destpêkê de 24 xalên vê konwansiyonê hebûne, piştî niqaşan daketiye 19 xalan. Di mesûlîyetgirtina vê konwansiyonê de berê îmzekirin heye û paşê jî tesdîqkirin heye. Gelek dewletan di destpêkê de ev konwansiyon îmze kirine lê di parlamentoya xwe re derbas nekirine ango tesdîq nekirine û jê berpîrsiyar nebûne. Hin dewletan, di serî de him îmze kirine û him jî tesdîq kirine. Lîsteya van dewletan heye, hek hewce be ez dikarim ji we re bixwînim. Di vir de helwesta Dewletên Yekbûyî yên Emerîkaya (DYE) pir balkêş e. Yek ji îmzekerên ewil DYE ye, lê di sala 1988an de tesdîq kiriye. DYE, çil salî sekiniye.

Etîmolojîya jenosîdê

Li ser etîmolojîya vê têgînê jî niqaşek heye. Dibêjin ku ev têgîn, ji "genos" a Yûnanî û ji "sîd" a Latîni pêk hatiye. Wateya "genos"ê nijad, netew û hwd e, wateya "sîd"ê jî kuştin e. Tirkan jî ji ber vê yekê peyva "soykırım" çêkirine. Îtirazek heye ku ev ne ji "genos" a Yûnanî hatiye, ev ji "genesîs" a Latîni hatiye. Ev îtiraz jî li ser niqaşa di derbarê bervirehîya vê têgînê de derdikeve holê. Hek tu "genos" wek esas bigirî, di konwansiyonê de civakên olî jî dikevin ber jenosîdê, wê çaxê divê ev li derve bimîne. Di civînên Neteweyên Yekbûyî de ev yek tê niqaşkirin. Dibêjin ku, divê em bervirehîya vê têgînê ji etîmolojîya wê derxin. Madem ku ev têgîn ji "genos" tê, divê em wê bi vê sînor bikin, tenê qirkirinên mîlî, etnîkî û nijadî dibin jenosîd. Yên ku dixwazin qirkirinên sîyasî, çandî û hwd jî tev li têgîna jenosîdê bikin û vê têgînê berfirehtir bikin, etîmolojîya jenosîdê ne bi "genos"ê bi "genesîs"ê tarîf dikin. Wateya "genesîs"ê bûyin e, di Tewratê de wek "tekvin" û bi Tirkî jî wek "oluş" tê binavkirin. Gava tu etîmolojîya jenosîdê wek "genesîs" bipejirîni, tu dikarî wan tiştên din (sîyasî, çandî û hwd) jî têxe nav têgîna jenosîdê.

Di vê mijarê de hin niqaş di nav Sowyet û dewletên din de hene. Sowyet tişteki dixwaze û tişteki jî red dike. Di tarîfa ewil de, grûbên etnîkî, nijadî, sîyasî, olî û yên din hene. Sowyet li dijî beşa sîyasî derdikeve û bi îsrar dixwaze ku qirkirina çandî di konwansiyonê de hebe. Sowyet, ji ber hin sedeman naxwaze ku qirkirinên sîyasî di konwansiyonê de hebin, hin argumantên wan hene û di derheq wan de hin îdia hene. Ji ber ku Stalîn qirkirinên sîyasî kirine, Sowyet naxwaze ku ev xal di nav konwansiyonê de hebe. Bi taybet Emerîka û Brîtanya û hin dewletên din jî li hember qirkirina çandî derdikevin.

Konwansiyona 1948an ne dokumenteke zanistî ye û ne dokumenta Lemkin e jî. Ev dokumenteke sîyasî û dîplomatîk e, bi lihevkerina huqûq û sîyasetê derketiye holê. Ji bo ku dewlet bikaribin li ser vê konwansiyonê li hev bikin, her dewletê ji hêla xwe ve mudaxele kiriye, piştî van niqaş û mudaxeleyan ev konwansiyon ji teref Neteweyên Yekbûyî ve hatiye pejirandin.

Dokument û peymanên navdewletî, ji bo me ne referansên rastîyê ne. Di karên sîyasetê de hin realîte hene, ji bo têkilîyên navdewletî hin sazî û dezgehên navnetewî pêwîst in an jî realîte ne, tu mecbûr î ku bi wan re têkilîyan saz bikî. Lê hek tu li pê rastîyê be, hek tu li rastîyê digêrî, ev dokument an jî peymanên navdewletî ji bo me nabin referansên rastîyê. Divê em bikaribin ku wan jî rexne bikin û xwe bispêrin heş û wîjdanê xwe. Hek em konwansiyonên navdewletî ji xwe re bikin referans, em ê ji rastîya welatê xwe dûr bikevin.

Rojhilata Nêzîk: Herêma jenosîdê

Hevalên hêja, ez dixwazim jenosîda li Kurdîstanê, di sê xalan de niqaş bikim. Yek jê xala herêmî ye, dudu taybetmendiyên Sîstema Serwerîya Tirkan e, sisê kar û barên vê sîstemê yên li Kurdîstanê ye.

Em ê ku derê ji xwe re wek herêm bihesibînin? Pirseke wer li holê ye. Di vî 40-50 salên dawîn de, rewşenbîr û sîyasetmedarên Kurdan jî, milletê Kurd wek milletê Rojhilata Navîn tarîf dikin; Kurdîstanê jî wek welatekî Rojhilata Navîn tarîf dikin. Ev tarîf bi awayekî li ser me hatiye ferzkirin. Ê mixabin nayê muhakemekirin. Li dinyayê Rojhilat aniha du beş e; Rojhilata Navîn û Rojhilata Dûr. Hek em bi heşekî, mantixekî pir sivik lêbinêrin; çiyekî navîn û dûr hebe, divê nêzîk jî hebe. Dema em programa karê xwe çêdikin, em dibêjin merhaleye nêzîk, navîn û dûr.

Berê Rojhilat ji sê beşan pêk dihat; Rojhilata Nêzîk, Rojhilata Navîn û Rojhilata Dûr. Ev binavkirin ji derve (exonym) bû, ne ku Rojhilatîyan ev nav li xwe dikirin. Rojavayîyan ev nav li herêma wan kirine. Bi Bîzansîyan ev binavkirin dest pê kiriye. Bîzansî axa xwe ya li rojhilatê Bîzansê (Stenbolê) wek Anatolia (Anadolû) bi nav dike, Anatolia, axa Bîzansîyan ya ku li rojhilatê Stenbolê ye. Cîranê Bîzansîyan yên li rojhilat, cîranê yekem yê sererast Rojhilata Nêzîk e, yê ji Rojhilata Nêzîk wêde Rojhilata Navîn e û jê wêdetir jî Rojhilata Dûr e.

Heta salên 1930yî, di lîteraturê de jî binavkirin wisa bû. Ji wan salan vir ve, Rojhilata Nêzîk ji tedawulê rabûye û tu kes jî lê nafikire ku ev Rojhilata Nêzîk bi ku de çûye. Piştî ku Rojhilata Nêzîk ji tedawulê rabûye, nêvîyê Kurdan bûye qewmê Rojhilata Navîn û ji sedî 42yê wan (Kurdên Bakur) jî bi awayekî wek Rojavayî hatine qebûlkin.

Li vir divê ez bibêjim ku, ev ne meseleya binavkirinê ye, Rojhilata Nêzîk bi serê xwe herêmek di nav rojhilat û rojava de ye. Çanda vê herêmê û çanda Rojhilata Navîn ne wek hev in. Awayên sîyasetê yên li vê herêmê û yên rojhilat û rojava jî ne wek hev in. Herêmek derbasbûyinê ye, wek pirekê ye, di nav rojhilat û rojava de wek pirekê ye.

Di der heq karê Rojhilata Nêzîk de Konferansa Lozanê

Ev têgîn cara dawîn di dokumentên fermî de, di Peymana Lozanê de derbas dibe. Hun dizanin ku Peymana Lozanê ji hêla Tirkan ve fetîşîze dibe, peymaneke gelek maqûl û peyman dameziranêr ya dewleta Tirkan tê qebûlkin. Feqet tiştêkî xerîb e, Tirk navê vê peymanê yê bi giştî tu caran nabêjin, tenha dibêjin Peymana Lozanê. Navê vê peymanê yê fermî ev e; di derheq karê Rojhilata Nêzîk de konferansa Lozanê (Yakındoğu İşleri hakkında Lozan Konferansı). Ji vê hîne em fahm dikin ku serdestên herba cîhanê, ji bo tanzîmkirina Rojhilata Nêzîk ev konferans li dar xistine, ji bo pirsgirikên Rojhilata Nêzîk çareser bibin ev konferans li dar ketiye.

Feqet di netîceya vê konferansê de Rojhilata Nêzîk ji holê rakirine. Sîstema dewletan ya piştî herba cîhanê, Rojhilata Nêzîk û Rojhilata Navîn li dar xistine, bi vê sîstema dewletan herêmek ji holê rakirine. Esasen hek tu bi fahmê jenosîdê lêbinêrî, ev jenosîda herî mezin e, herêmek bi tevayî ji holê rabûye, êdî Rojhilata Nêzîk nema tê bikaranîn.

Baş e, Rojhilata Nêzîk esaasen ku der e? Ev peyvên wenî hinekî rolatîf in, sînor hinekî vir de wê de tê û diçe; Lê esaasen ji rojhilatê Bahra Reş heta rojhilatê Bahra Spî ye. Wek cografya Rojhilata Nêzîk, ev der e. Hek wek welat em bijimêrin; Ermenîstan, Kurdîstan û Kîlîkya ne. Ev her sê welat, Rojhilata Nêzîk teşkîl dikin. Temama şerê Rojhilatî û Rojavayîyan li vê herêmê diqewime, Rojhilatî û Rojavayî ji bo ku zora hevdu bibin herb dikin, lê herba wan di vê herêmê de ye û bi giranî jî li Kurdîstanê ye.

Ez dikarim bibêjim ku Kurdîstan, welatê navendî yê Rojhilata Nêzîk e. Bi avakirina sîstema dewletan ya nuh ve, ev Rojhilata Nêzîk ji holê rabû, Kurdîstan hat dabêşkirin, sê beşên Kurdîstanê êdî wek perçeyên dewletên Rojhilata Navîn hatin qebûlkirin, beşa wê ya mezin, bakurê Kurdîstanê jî wek perçeyekî sîstema Tirkan ya Rojavayî hat qebûlkirin.

Ev der ango Rojhilata Nêzîk, mekanê jenosîdê yê dewleta Tirkan e. Ji hin dewletan re deverên nifûzê hene, wek bakurê Efrîkayê herêma nifûzê ya Frenseyê ye. Herêma jenosîdê ya dewleta Tirkan jî Rojhilata Nêzîk e. Temama karû barên jenosîdê li vir qewimîne. Jenosîda Ermenan li vir e, komkujiya Pontûsan li vê herêmê ye, jenosîda Ermenên li Kîlîkyayê li vê herêmê ye. Xalek din jî ew e ku Nûsayrî jî gelê vê herêmê ye. Wek ku hun dizanin Nûsayrî di nav Tirkîye û Sûrî de du beş bûn, çîyayên Nûsayrîyan di nav dewletên Tirkîye û Sûrî de wek sînor hatiye qebûlkirin, nêvîyê wan li hêla Tirkan mane, li bajarên Antakya û Mersînê mane, li wan deran bi cî bûne. Yên li Sûrî jî bi giranî li derdora Tedmîr û Lazkiyê mane. Li Tirkîyê Nûsayrî wek Şîî an Alewî tîn binavkirin. Bawerîya wan a olî nêzîkî ya Alewîtiyê ye, ew û Sersorên Dêrsimê, tam ji sedî sed ne di bawerîyek olî de bin jî, muşterekên wan yê olî gelek in, Nûsayrî jî di vê herêmê de ne.

Ev herêm bi ya min, ji bo fahmkirina pirsgerêka Kurdîstanê jî, ji bo jenosîda sîstema Tirkan jî, fahmkirina vê herêmê û jîholêrakirina vê herêmê, kilîda fahmkirîne ye. Ji ber vê yekê divê em li ser bifikirin.

Gelek çarvan têgînek, koka fikirandina me diguherîne. Bawer im 7-8 sal berê, li ser mijara Rojhilata Nêzîk ez fikirîm. Ji wê çaxê vir ve, kî li cem min dibêje "em ji Rojhilata Navîn in", ez diqehirim û dibêjim, "na em ne ji Rojhilata Navîn in, em ji Rojhilata Nêzîk in." Bawer bikin ku têgîna Rojhilata Nêzîk, gelek tesîr li ray û ramanên min kir û helwesta min a siyasî jî bi vê têgînê hat guhertin. Ji bo wê jî, ji hevalan re pêşniyar dikim ku, mîletê Kurd wek mîletekî Rojhilata Nêzîk, Kurdîstanê jî wek welatekî Rojhilata Nêzîk tarîf bikin û bifikirin, hun ê bibînin ku, ev yek gelek guherandinan di ray û ramanên mirov de çêdike.

Taybetmendiyên Sîstema Serwerîya Tirkan

Hevalno, di vir de aloziyeke fikrî jî heye, di serî de jî min qal kiribû. Bi salan me got kolonyalîzm, lê gava me digot kolonyalîzm jî, me hin tişt îzah nedikir. Gava me digot ku Kurdîstan Kolonî ye jî hin valahî hebûn. Valahîya ku hebû çî ye? Kolonî bi xwe jî statuyek e, gelên kolonî xwedîyê statuyekê ne, ew statu jî bi terma kolonî ve hatiye ifadekirin. Welatek, mîletek heye ku ji teref dewletên kolonyalîst hatiye dagirkirin, di binê serwerîya wê dewletê de ye, ev binavkirin wê rewşê dîyar dike.

Di têkilîyên Sîstema Tirkan û Kurdîstanê de ev yek tune. Temama zulm û zordariya kolonyalîzmê heye, dagirkeriya sîstemê ya li Kurdîstanê heye, feqet vê sîstemê statuyek

nedaye Kurd û Kurdîstanê. Gava ku mamoste Beşikçi dibêje ku Kurdîstan ne kolonî ye jî (Kürdistan sömürge bile değil), qesta wî ev e. Li vir analîzeke nuh, fahm û têgîneke nuh pêwîst e.

Sîstema Serwerîya Tirkan jenosîdkar e

Ez, ji bo Dewleta Tirkiyê, Sîstema Serwerîya Tirkan bi kar tînim û lê zêde dikim ku ev sîstem, sîstemeke jenosîdkar e. Ji ber ku ev sîstem jenosîdkar e, tu satatu nedaye miletên ku li wan hukum dike û îşareta her statuyê ji bo xwe wek mirinê dibîne. Bi ya min ev encama sîstemê ya jenosîdkar e. Kolonyalîzm li gelek deverên dinyayê heye, sûcekî li dij mirovatîyê ye, qirêj e. Lê tew nebe koloniyên xwe nas dikin, bi nav dikin û statuyekê didin wan. Di dagirkerîya Sîstema Tirkan de ev tune, ev cure kolonyalîzma vê sîstemê, bi jenosîdkariyê ve mumkun e. Ji ber ku jenosîdkarî karakterê vê sîstemê ye, tu statuyê ji tu kesî re qebûl nake, tenê ew xwedî statu ye. Bêstatukirin bi xwe, yanî gava tu miletekî bêstatu bihêle, esasen ev bi xwe jenosîd e. Yanî tu statuya wî miletî, wî welatî tu qebûl nakî, rasteqînîya wî ya mîlî û welatî tu dixwazî ji holê rakî, li gor min ev kar bi xwe karekî jenosîdî ye. Ez dixwazim vê pirsî bikim; tu temama Kurdan bikujî, tu qetlîamên mezin li Kurdîstanê bikî ev jenosîd e, baş e tu tenê Kurdekî jî nekujî û tu Kurdîtîyê bikujî, ev jenosîd e an ne jenosîd e? Di jenosîda Kurdîstanê de pirsê sereke ya ku ez dipirsim ev e û bersîva min ev e ku, tenê Kurdekî nekuje jî, hek Kurdayetîyê bikuje ev jenosîd e. Tu komunîteyekê ji holê radikî û tu dixwazî li rûyê erdê nasnameyê wenî nemîne, di bin serwerîya te de komunîteyê wenî nemîne, ez bersîva vê pirsê bi êrênî didim û dibêjim ku tenê Kurdek neyê kuştin jî, karê Sîstema Tirkan daye ber xwe ku Kurdîtîyê ji holê radike, aîdiyeta rasteqînîya vî miletî ji holê radike, ev bi xwe karekî jenosîdê ye.

Komara Tirkiyeyê tesadufêke tarîxî ye, ne berdewama tarîxeke xwezayî ye

Ez ê di sê-çar xalan de jî qala Sîstema Serwerîya Tirkan bikim. Dîroka Tirkan ya fermî, avakirina vê dewletê bi herbeke mîlî îzah dike. Dibêjin ku ji Gulana 1919an heta sala 1923yan me şerekî mîlî daye, di netîceya vî şerê mîlî de jî, me ev cumhûriyet ava kiriye. Ji xêndî Tirkan, tu gelên ku ji împaratorîyê mane, ne xwedîyê tezeke wisa ne. Wek nimûne; di herba cîhanê ya yekem de, împaratorîya Almanî jî belav bû, di şer de têk çû û bi Peymana Versayê ku dibêjin ji bo Almanan ev sedema herba cîhanê ya duyem e, gelek zordestî li Almanan hat kirin. Feqet nehat bîra tu Almanî ku vê herba ku tê de têk çûne wek herbeke mîlî biparêzin. Împaratorîya Awûstûrya-Macarîstan jî di herba cîhanê ya yekem de têk çû, nehat bîra wan jî ku vê xisara xwe, vê têkçûn û biçûkbûna împaratorîya xwe wek herbeke mîlî tarîf bikin.

Tenha hat bîra îdeolog û sîyasetmedarên Tirkan ku wek împaratorîyekê ketine herbekê, di wê herbê de têk çûne, kîjan împaratorî di kîjan şerî de têk here ew ê hin xisaran bibîne; ax, aborî, hêza leşkerî û gelek tiştên din yên împaratorîyê wê kêmbibin. Ev tiştêkî xwezayî ye, lê Tirkan ev berovajî kiriye; mayîna xwe ya li ser lingan, tiştên ji împaratorîyê di dest wan de mane, wek herbeke mîlî tarîf kirine. Yek jê, divê ev bê redkirin, tiştêkî wenî li holê tune ye. Hun împaratorî bûn, hun ketin herbekê û we wenda kir, hun têk çûn. Ji ber ku we wenda kir, hun ê bedela wendakirinê jî bibînin. We şer kiriye ku hun sînorê xwe biçûktir nekin, temama hedefa şerê ji 1919an heta 1923yan ev e û Mîsaki Mîlîya wan jî ev e. Mîsaki Mîlî dibêje ku, gava peyman mutarekê hat îmzekirin, çî axa di bin serwerîya dewleta Osmanî de maye, em ji wê tawîz nadin. Ev peyman mutarekê, peymanêke kolonyalîst e, ew peyman ji xwe re kiriye referans û dibêje ku ez ji wir şûn ve gavê navêjim. Çî eleqeya vê helwestê bi herba mîlî re heye? Te xwestiye ku tiştên ku tu wenda dikî li derekê bisekinîne, temama wateya herba ji 1919an heta 1923yan ev e. Jixwe ev dewama herba yekem e, herba yekem di 1918an de bi derbekê naqede, erê Konferansa Parîsê ya Aşitîyê çêdibe, nîzama piştî herbê li wir tê tayînkirin, lê wek depremên ku li pê deprema sereke pêk tên, herba cîhanê ya yekem hîn didome, pirtir jî li herêma me ev şer didome, li Rojhilata Nêzîk ev şer didome.

Ev sîstem perçeyekî sîstema cîhanê hatiye qebûlkirin, serdestên herba cîhanê ya yekem, nîzameke dewletê li ser dinyayê ferz kirine û bingeha vê nîzamê jî li Konferansa Aştiyê ya Parîsê hatiye danîn, hin dezgehên navdewletî ava kirine; Cemîyetî Akwam (bi Kurmancî em dikarin bibêjin Koma Miletan), yek ji wan dezgehan e. Bi destê vê dezgehê sîstemeke dewletê li herêma me ava kirine. Komara Tirkîyê, perçeyekî vê sîstemê ye, avakerên vê sîstemê xwestine ku, wek dewama Osmanî dewletek bibe perçeyekî vê sîstemê, ne ku bi hêz û şerê îtîhatçiyên an beşê wan yê mînimîmalîst ku ji wan re dibêjin Kemalîst, ev dewlet ava bûye, ev dewlet perçeyekî vê sîstemê ava bûye.

Li vir hewceyî gotinê ye ku, di despêka şerê herba cîhanê yê yekem de, jiholêrakirina dewleta Osmanî yek ji hedefên Mutefîkan bû û Mutefîkan jî li ser vê li hev kiribûn jî. Rûsya, Brîtanya û Frense, paşê Îtalya jî tev li wan bû, wan li hev kiribûn ku piştî herbê hek em bi ser kevin, em ê li vê herêmê dewleteke Osmanî li holê nehêlin. Heta tê gotin ku di sala 1913-14an de, gava Wilson dibe serokdewletê Emerîkayê, jê tê pirsîn ku, ma em konsolosxaneyekê li Stebolê li dewleta Osmanî jî venekin? Bersîva Wilson pir balkêş e; dibêje ku "ma bi vî navî dewletek wê bimîne? Çawa be piştî herba cîhanê ev dewlet wê ji holê rabe, em belasebeb konsolosê xwe neşînin wê derê". Di herba yekem de heşê Rojavayîyan yê di derheq Osmanîyan de ev bû. Heta Şoreşa Rûsyayê (Ocktober), di hedefa mutefîkan de ev hebû ku wê axa Osmanîyan di nav xwe de par bikin û dewleta Osmanî wê li rûyê erdê nemîne. Ya ku di serî de ev plan xera kiriya Şoreşa Rûsyayê ye. Piştî vê şoreşê, Sowyet ji vê tifaqê vekîşiyaye. Piştî ku Împaratorîyên Alman, Awûstûrya-Macarîstan û Osmanî têk çûn, di nav mutefîkan de şer dest pê kiriye, êdî şerê esasî di navbera Brîtanya û Sowyetê de ye, yê ku berê hevalên hev bûn, ji nuşka ve dibin dijminên hev. Brîtanya û temama dinyayê jî, di serî de Şoreşa Oktobê pir girîng nabînin û li bende ne ku ew ê di demeke nêzik de têk here. Lê di salên 1921-22an de dewletên cîhanê êdî qebûl dikin ku ev dewlet wê li ser lingan bimîne. Ji ber vê yekê, ji bo Brîtanya û Fransa li hember Sowyetê dewleteke tampon pêwîst dibe, ji bo balansa hêzên cîhanê yê nuh, ji bo pêşîlêgirtina komunîzm û Sowyetê, li herêmê dewleteke tampon bi dilê wan e, vî hesabî dikin. Ji hêla Sowyetê, hek qebûl bike ku ev dewama Împaratorîya Rûsyayê ye, Osmanî di hedefa Rûsan de bû ku ji holê bê rakirin, cîyê Osmanî ji aliyê Sowyetê tê guherandin, li hemberî hucûmên dewletên emperyalîst, dewleteke tampon li wir hebe, ji bo Sowyetê baştir e. Îtalya, hun dizanin ku ew deverên Ege û heta perçeyekî Behra Spî jî dabûn Îtalyayê ku di 1915an de ew jî li gel mutefîkan beşdarî herba cîhanê bibe, feqet di dawîya herbê de, Brîtanya çavê xwe bera wê herêmê da, Îtalya ji vê tifaqê vekîşiya û tê gotin ku ji hemû civînên di nav mutefîkan de çêdibûn, Îtalya hêzên Kemalîst haydar dikir.

Di netîceya van guherinan de ev Sîstema Serwerîya Tirkan derketiye holê, bi dînamîkên Tirkîye yê hundir, bi şerê wan yê mîlî ev dewlet ava nebûye. Ev dewlet, perçeyekî sîstema dewletan ya nuh ku ji teref Rojavayîyan ve tê avakirin derdikeve holê, perçeyekî wê ye û bi van guherandinên balansa hêzên dinyayê derketiye holê. Ji ber vê yekê, ez wer dinirxînim ku Komara Tirkîyeyê, tesadufeke tarîxî ye. Ne berdewama tarîxeke xwezayî ye, tesadufek tarîxî ye û li ser vê tesadufê ava bûye û dewam kiriye.

Aloktonên ku ev sîstem ava kirine (Asli Unsur); Tirk, Cihûd û Çerkez.

Ez ê çend xalên din jî bînim ziman. Yek jê ev e ku ev sîstem xwe dispêre kê? Ji bo spartekên li paş vê sîstemê gelek niqaş hene; xwe dispêre bûrjûwayê tîcaretê, xwe dispêre tifaqa gundî û taciran, xwe dispêre brokrasiya sîvîl û leşkerî û hwd. Gelek niqaşên wenî hene, ez dixwazim li vir niqaşeke din bikim. Wek millet, wek gel, wek etnîsîte ev Sîstema Serwerîya Tirkan xwe dispêre kê? Spartekên vê dewletê yê etnîkî kî ne? Dixwazim di vî warî de çend gotinan bêjim, ji bo wê jî gerek em denkleman kevn xera bikin. Yek ji wan denkleman ev e ku şerê 1919-1923yan wek şerê Muslum û Xêrimuslum tê tarîfkirin ku temama gelên Musliman bi hev re tîfak çêkîrine û şerê

Xêrîmusluman kirine, heta ji me jî gelek kes dibêjin ku Kurd jî Musluman in û pê xapiyanin, gotinin ku em jî Musluman in ew jî Musluman in, lewra divê em bi kafiran re şer bikin. Bi ya min ev denklema ji kok ve şaş e. Denklema 1919-23yan ne denklema Muslum û Xêrîmusluman e, denklema alokton û otoktonan e. Ew gelên ku ji dûr ve hatinin û erdekî nuh ji xwe re wek welat pejirandine alokton in, ew gelên ku ji kevn ve li ser erdê xwe dijîn jî otokton in.

Di vir de yê her du denkleman jî xera dikin hene, denklema Muslum-Xêrîmuslum Cihûd (Yahûdî) xera dikin, bi sebeb ku Cihûd ne Muslum in lê bi Musluman re meşiyane, di nav Musluman de cî girtine, him rêvebirîya şerê 1919-23yan kirine, him di îdeolojîya Komara Tirkîyeyê, him jî di wêjeya Komarê ya piştî 1923yan de, tevî ku ne Muslum in jî serokatîya vê dewleta ku wek Muslum tê pejirandin kirine.

Yên ku vê denklema alokton û otoktonan xera dikin jî Kurd in. Esasen divê bê dîtîna ku di hedefa vê grûbê de tasfîyekirina otoktonan heye, gelê ku herî zêde hedefa vê êrîşê jî Kurd in, lê em dibînin ku Kurd di vê denklema de, li cîyekî şaş, bi aloktonan re kar dikin. Tabî di vir de, em nikarin bibêjin ku temama Kurdan ji 1919an heta 1923yan wenî kirine, dezgehekî Kurdan tune ku temama Kurdan temsîl bike, temama Kurdan bera pê daye û helwesteke wenî girtine. Lê meyleke wenî heye ku piraya Kurdan li vî alî xwiya dikin.

Vê sîstemê ji roja ewil de xwe wek netewedewlet tarîf kiriye, feqet netewek li paş tune, ev komikên alokton ku li gor min yê esasî Çerkez, Cihûd û Tirk in, rêvebirîya hemû van grûban kirine. Ji van komik û grûban miletek dernakeve, wek koalîsyonekê ye. Pirsgerêka vê dewletê ev e, yanî ji berdewamiya Osmanîyan cûmhûrîyeteke ava kirine, ev cûmhûrîyet wê bibe netewedewlet, lê li holê netew tune. Biryar dane ku netewekî biafirînin, netewekî ava bikin, ev biryar dane. Li pêşiya vê biryarê, li pêşiya netewedewletê hin asteng hene. Di nav otoktonan de Ermen, Rûm, Suryan û Kildan hatine tasfîyekirin, êdî ji bo wan ev ne astenegeke mezin e, astenga herî mezin ku hîn bi xurtî li holê ye Kurd in. Ji bo ku bi destê vê dewletê miletek bê avakirin, lazim e ev millet (Kurd) ji holê rabe. Ji bo Sîstema Serwerîya Tirkan pêwîst e ku milletê Kurd ji holê rabe, ji bo vê yekê jî du rê hene; yek jê tu yê bi awayekî fîzîkî Kurdan ji holê rake ku asteng li ber te nemîne. Vê sîstemê ev yek mumkun nedîtiye; him ji bo hêza xwe ev mumkun nedîtiye, him jî ji ber ku Kurd ewqas pir in û li ser welatekî ewqas berfireh cî digirin ku bi tu awayî bi dawî nabin, em bibêjin ku te hemû Kurd ji holê rakir û Kurdîstan vala kir, tu yê çi têxe dewsa Kurdîstan? Tu bikaribî hemû Kurdan ji holê rake jî astengî xelas nabe, ev yek; ya duyem Kurdîstana ku di destê Komara Tirkîyeyê de maye ji sedî 42yê Kurdîstanê ye, ji sedî 58ê Kurdîstanê jî di nav dewletên din de parve bûye, bi jiholêrakirina perçeyekî tu nikarî Kurdîstanê jî ji holê rake. Ji ber vê yekê jenosîda fîzîkî, qirkirina fîzîkî ya Kurdan, vê dewletê ji xwe re nekiriye hedef. Ji dêvla vê, jiholêrakirina rasteqînîya millet û welatê Kurdan bûye hedefa jenosîda vê dewletê. Jenosîda ku Dewleta Tirkan li Kudîstanê tetbîq dike, bi vê hedefê re girêdayîye. Ew ê rasteqînîya millet û welatê Kurdan ji holê rake.

Kar û barên vê sîstemê yê li Kurdîstanê

Yek jê, divê ez qala mufetîşîya umûmî bikim. Kurdîstan, ji 1927an heta 1947an, bîst salan ji teref mufetîşîya umûmî hatiye îdarekirin, çar mufetîşîyên umûmî ava kiribûn, ya pêncan wê li Hatayê ava bikirina, dûre di 1952an de qanûne wê ji holê rabûye.

Mufetîşîya umûmî ya yekem, li Dîyarbekir û derdora wê saz kirine. Ya duyem li Trakya saz kirine; Edîrne, Qirklarelî, Tekîrdax û Çanaqale. Ya sêyem li Erziromê û ya çarem jî li Dêrsimê saz kirine, xwestine ku ya pêncem jî li Hatayê saz bikin.

Dema ku tu li cîyên mufetişîya umûmî dinêrî, tu qada dewleta Tirkan ya jenosîdê dibînî. Ev mufetişîyên umûmî, bi ya min li Kurdîstanê dezgehên jenosîdê ne. Bi pirsan em dikarin hîn li ser vê mijarê kûr û dûr bisekinin.

Ji ber ku dema me nemaye, ez ê hin xalên din wek sernivîs bînim ziman:

- Jiholêrakirina medreseyan.

- Qanûna memûrîn muhakematê. Ev qanûn, piştî qirkirina Ermenan derketiye. Ev qanûn, li Kurdîstanê ji bo parastina karmendên jenosîdê hatiye bikaranîn. Cara yekem, Mehmet Axar (Mehmet Ağar) got ku, "ji ber vê qanûnê ez nikarim bipeyivim", ango vê qanûnê destê wî girêdaye. Ev qanûn ji bo çi lazim e? Dewlet wê karên qirêj bike, jenosîdê bidomîne, bi destê karmendên xwe wê vî karî bike, ji bo ku karmendên xwe biparêze ev qanûn derxistiye. Ev qanûn jî yek ji dezgehên jenosîdê ye.

- Îskana mecbûrî.

- Qanûna Dêrsimê.

- Raporên Dewleta Tirkan. Ji rapora Îsmet İnönü û heta ya Fewzî Çakmak bi dehan raporên dewletê hene ku, dewletê ji serî de nêrî kiriye û biryar daye ku jenosîdê bi kar bîne. Hek em li ser raporên wan jî hûr bibin, em ê bibînin ku ji bo jenosîdê her tişt di hemû kar û barên Sîstema Serwerîya Tirkan de heye.